


Wêje û Rexne

hejmar: 3 sal: 2014

kovara lêkolîn, rexne û teoriya wêjeyê

Îlon • Cotmeh • Mijdar • Kanûn



DOÇ. DR. ABDURRAHMAN ADAK*

DI EDEBIYATA KURDÎ YA KLASÎK DE MESNEWIYÊN LEYLA Û MECNÛNÊ

DESTPÊK

Leyla û Mecnûn, navên du qehremanên serpêhatiyeteke evînî ne ku ev serpêhatî di edebiyata klasîk a gelên rojhilatê yên misliman de, gelek caran ji bo berhemên edebî yên bi terzê mesnewiyê bûye mijar. Çi *Leyla û Mecnûn* be, çî jî *Mem û Zîn*, *Yûsif û Zelîxa*, yan jî *Xusrew û Şêrîn* be, di edebiyata kurdî ya klasîk de hebûna van mesnewiyên ku behsa serpêhatiya du evîndaran dikin diyardeyeke gelekî girîng e. Bi rastî jî, di edebiyata kurdî ya klasîk de mijarên bi vî rengî, hem ji aliyê qewareya nimûne û destxetan ve, hem jî ji aliyê asta wan a edebî ve, ji mijarên dî hemûyan zêdetir balê dikişînin ser xwe. Ev diyarde ye ku di nav edebiyata klasîk a gelên rojhilatê yên misliman de hebûnekê bexşî edebiyata kurdî ya klasîk jî dike.

Ji ber ku ji serpêhatiyên navborî *Mem û Zîn*, aîdê civak û edebiyata gelê kurd e, bi awayekî xwezayî wê, hem di çarçoveya disîplîna edebiyata kurdî ya klasîk de, hem jî di çarçoveya gelek disîplînên dî yên wekî dîrok, folklor û hwd. de, ji serpêhatiyên dî zêdetir bala lêkolînerên kurd kişandiyê. Bêguman *Mem û Zîn*, hêjayî xebatên hê zêdetir e jî, lêbelê edebiyata kurdî ya klasîk ne ji wê tenê pêk tê û ji bo bidestxistina têgihîştineke berfireh a edebiyata kurdî ya klasîk, pêwîst e li ser mesnewiyên dî jî xebatên zanistî bîn kirin.

* Serokê Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî li Zanîngeha Mardin Artukluyê.

Ji van serpêhatiyên evîndariyê ya ku di edebiyatên gelên rojhilatê yê misliman (edebiyata erebî, farisî, tirkî û urdû) de herî zêde navdar û berbelav, *Leyla û Mecnûn* e. Serpêhatiya *Leyla û Mecnûn* di van edebiyatan de gelek caran di berhemên bi terzê mesnewiyê de hatiye hûnandin. Paralelî vê berbelaviya *Leyla û Mecnûn* ya di edebiyatên gelên rojhilatê de, di edebiyata kurdî ya klasîk de jî serpêhatiya *Leyla û Mecnûn* ji aliyê gelek nivîskaran ve bi kurdî hatiye nivîsandin.

Digel ku di edebiyata kurdî ya klasîk de cihekî girîng ê *Leyla û Mecnûn*an heye jî, bi qasî ku tê zanîn, heta niha *Leyla û Mecnûn*ên kurdî bi hev re nebûne mijara xebatekê. Her çiqas Marûf Xeznedar û Abdulrehman Mizuri di xebatên xwe de cih dane hinek ji van *Leyla û Mecnûn*an jî, ev ji rêzkirina navên wan derbas nebûye.¹

Hem ji ber cihê girîng ê *Leyla û Mecnûn* di edebiyata kurdî ya klasîk de, hem jî ji ber kêmasiya xebatên di vî warî de, me xwest ku em *Leyla û Mecnûn*ên kurdî bikin mijara vê nivîsê û bala lêkolîneran bikişînin ser vê mijara berfireh. Di nivîsê de agahiyên sereke yê bi mijara *Leyla û Mecnûn* re têkildar bi nêrîneke giştî dê bînin dayîn û ji bo xebatên ku ji niha şûn de li ser *Leyla û Mecnûn* bînin kirin gaveke bingehî dê bê avêtin. Di vê çarçoveyê de pêşî kurteya serpêhatiya *Leyla û Mecnûn* dê bê dayîn, pişt re wekî destpêkekê mesnewiyên *Leyla û Mecnûn* yê di zimanên erebî, farisî, tirkî û urdû de hatine nivîsandin dê bi kurtî bînin pêşkêşkirin, pişt re *Leyla û Mecnûn*ên ku bi zimanê kurdî hatine nivîsandin dê yek yek bînin nasandin, pişt re jî dê analîz û nirxandineke giştî li ser *Leyla û Mecnûn*ên kurdî bê kirin. Herî dawî nivîs dê bi encamekê bê qedandin.

I. SERPÊHATIYA LEYLA Û MECNÛNÊ

Serpêhatiya *Leyla û Mecnûn* ya evîndariyê, ne çîrokeke çêkirî ye, berevajiyê wê herdu qehremanên wê *Leyla û Mecnûn*, du kesayetên tarîxî ne ku di sedsala VIIem de di serdema Dewleta Emewîyan de di

1 Xeznedar, bêyî tu danasîn û şîroveyan navên 5 *Leyla û Mecnûn*ên kurdî (*Leyla û Mecnûn*ên Mela Mihemedê Qulî Kendûleyî, Mîrza Şefî'ê Kulyayî, Mela Weledxan, Mela Mehmûdê Bazîdî û Sewadî) li pey hev rêz kirine. Mizuri jî digel hinek têbîniyên biçûk cih daye navên 9 *Leyla û Mecnûn*ên kurdî (*Leyla û Mecnûn*ên Mela Mihemedê Qulî Kendûleyî, Mîrza Şefî'ê Kulyayî, Mela Weledxan, Ebdulqadir Debayan, Mela Fercî Salih Şekîb, Eli Kemal Bapîr, Ebdulcebbar Axayî Kanî, Sewadî, Mela Mehmûdê Bazîdî). Bnr. Marûf Xeznedar, *Mêjuwî Edebî Kurdî*, weş. Aras, Hewlêr 2010, c.I, r. 201; Abdulrehman Mizuri, "Leyla û Mecnûna Harisê Bitlîsî", wer. Alîxan Aras, <http://aso-zagrosi.over-blog.com/article-30477610.html>. (15.08.2014)

dema hikumdar Merwan b. Hekem de li herêma Necdê jiyana xwe bûrandine û di navbera herduyan de serpêhatiyeke evînî qewimiye. Leyla, keça Mehdiyê kurê Se'dê Amirî (Leyla bint Mehdî bin Se'd el-'Amirî) ye. Heçî Mecnûn e, li gorî nêrînekê ew, helbestvanekî bi navê Qeysê kurê Mulewwehê Amirî (Qeys b. Mulewweh el-'Amirî) ye ku di navbera salên 690-700î de miriye. Piştî ku ji ber evînê hişê wî ji serê wî çûye leqeba Mecnûn (dîn) lê hatiye danîn û pişt re ev leqeb ketiye şûna navê wî. Lê li gorî nêrîneke dî ku hinekî bi guman e, Mecnûn ciwanek ji malbata Emewiyan e ku bûye aşiqê keçapa xwe û ji ber ku nexwestiye evîna xwe aşkera bike, rewşa xwe ya evîndariyê bi awayekî menzûm aniye zimên û ew helbestên ku nivîsandine bi bal "Mecnûn" ve nîsbet kirine.

Bêyî ku em hûrgilî û cudahiyan di navbera varyantan de li ber çavan bigirin, bûyera ku di navbera Leyla û Mecnûnê de qewimiye bi kurtî weha dikare bê pêşkêşkirin:

Qeys û Leyla yên ku li Necdê dijiyan di dema çêrandina heywanên xwe de bûne evîndarê hev. Ji ber mezinahiya temenê wan an jî ji ber aşkerabûna evîna wan, malbata Leylayê ew xistine binê konekî û nehiştine ku Qeys wê bibîne. Ji ber vê yekê li cem Qeys izdirab û êşa evînê ya pêşî dest pê kiriye. Her çiqas bavê Qeys Leyla xwestiye jî, yan jî ber ku Leyla bi sedema evînê ketiya zimanê xelkê, yan jî ji ber ku evîndariya Qeys keça wan ruswa kiriye yan jî ji ber behanekeyeke dî ev teklîf hatiye redkirin û Lêyla bi kesekî dî re (Îbn Selam) hatiye nîşankirin. Qeysê ku ji ber vê yekê xemgîn bûye, bi tesîra izdirabên xwe hişê xwe bi tevahî wenda kiriye. Di vê demê de her çiqas Omer b. Ebdurrehmanê ku memûrê bacê yê hikumdarê Emewiyan Merwan b. Hekem bû û Newfel b. Musahiqê ku pişt re ketiye dewsa wî ji bo ku Qeys jî izdiraba wî xilas bikin, Leyla ji bavê wê xwestine û di encamê de pê re şer jî kirine, lêbelê ev teşebbusên wan jî bi kêrî tiştêkî nehatine. Bavê Qeys bi niyeta ku bi di'ayan baş bibe her çiqas ew biriye Mekke û Medîneyê jî, Qeys ji bo ku evîna wî zêde bibe di'a kiriye û bi çolan de reviyaye û heyata xwe bi heywanên wehşî re domandiye. Di dema jiyana çolê de Qeys, xezala ku çavên wê bi çavên Leylayê şibhandiye ji êrîşên nêçîrvanan parastiye. Di dawiyê de Leyla ji hesret û izdiraba Qeys miriye. Mecnûn jî bi gotina helbestan li ser wê û bi terennuma êşa evîna xwe bi çolan ketiye û rojekê termê wî hatiye dîtin.²

2 Ateş, Ahmed, "Leyla ile Mecnûn", *İslam Ansiklopedisi*, weş. MEB, İstanbul 1993, c.VII, r. 49-55; Ferrac, Ebdusettar Ehmed, *Dîwanu Mecnûn Leyla*, Daru Misr, Kahire 1979, r. 8-34; Pala, İskender, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, weş. L&M, İstanbul, 2002, r. 300-302.

II. DI EDEBIYATÊN EREBÎ, FARISÎ, TIRKÎ Û URDÛ DE MESNEWIYÊN *LEYLA Û MECNÛNÊ*

Serpêhatiya *Leyla û Mecnûnê* pêşî di nav helbestên Mecnûn (Qeys) bi xwe de cih girtiye. Lêbelê kesên ku ji ber evîndariyê navê Mecnûn li wan hatiye kirin ne Qeys tenê ye û loma jî helbestên van kesan jî bi bal Qeys ve hatine nîsbetkirin. Bûyer, ji van helbestan hatiye berhevkirin û pişt re wekî çîrokeke birêkûpêk hatiye sazkirin. Zimanzanên ereban heta demekê ev bûyer bi terzê bûyereke folklorik neqil kirine. Di edebiyata erebî de cara pêşî kesên wekî Îbn Quteybe û Ebu'l-Ferec el-Îsfahanî ev bûyer ji rawiyan berhev kirine û di nav berhemên xwe de (Îbn Quteybe, *eş-Şî'r ve'ş-Şu'era*; Ebu'l-Ferec el-Îsfahânî, *el-Exânî*) wekî beşekê cih dane bûyerê. Pişt re Ebûbekr el-Walibî *Diwan Mecnûn Leyla* (nivîsîn: 1300), Îbnu'l-Muberrred (k.d. 1503) *Nuzhetu'l-Musamir fi Exbar Mecnûn benî Amir* û Şemseddîn Elî b. Tûlun (k.d. 1546) *Best Samî el-Musamir fi Exbar Mecnûn Benî Amir* serpêhatiya *Leyla û Mecnûnê* bi awayekî rêkûpêk kom kirine. Di edebiyata erebî de bûyer, bi şeweya helbestên ku di nav dîwanekê de hatine komkirin hatiye nivîsandin.

Bûyera *Leyla û Mecnûnê*, cara pêşî bi tevahî û bi terzê mesnewiyê di edebiyata farisî de di sala 1188an de ji aliyê Nîzamiyê Gencewî (m. 1204) ve hatiye nivîsîn. Piştî vê menzûmeyaya Nîzamî li pey rêça wî hem di edebiyata farisî de, hem jî di edebiyata tirkî, kurdî û urdû de gelek mesnewiyên *Leyla û Mecnûnê* hatine nivîsîn. Di edebiyata farisî de piştî Nîzamî, berhemên herî girîng ên *Leyla û Mecnûnê* ji aliyê Xusrewê Dehlewî (m. 1325), Mela Camî (m. 1493), Mektebî (m. 1512) Katibî (m. 1436), Derwêş Eşref (sedsal: XV) û Suheyî (m. 1502) ve hatine dayîn.

Di edebiyata tirkî de cara pêşî ji aliyê Şahidî ve ev serpêhatî hatiye nivîsîn (sedsal: XV). Pişt re *Leyla û Mecnûnê* herî girîng ên bi tirkî ji aliyê Elîşîr Newaî (m. 1501), Hemdullah Hemdî (m. 1508) û Fuzûlî (m. 1556) ve hatine dayîn. Di edebiyata tirkî de bi tevahî bi qasî 30 heb *Leyla û Mecnûnê* hatine nivîsîn.

Di edebiyata urdû de jî menzûmeyên *Leyla û Mecnûnê* hatine nivîsîn. Mîr Mihemed Huseyin Tecellî (nivîsandin: 1784), Mîrza Lutf Elî Vila (sedsal: XIX), Mihemed Wezîr Xan (m. 1868) û hin kesên dî di vî warî de tên naskirin.³

III. DI EDEBIYATA KURDÎ DE MESNEWIYÊN *LEYLA Û MECNÛNÊ*

Çawa ku di edebiyata erebî, farisî, tirkî û urdû de mesnewiyên *Leyla û Mecnûnê* hatine nivîsandin, di edebiyata kurdî de jî jimareke nekêm mesnewiyên *Leyla û Mecnûn* hatine nivîsandin. Bi qasî ku heta niha hatiye tesbîtkirin, *Leyla û Mecnûnên* ku di edebiyata kurdî de hatine nivîsandin 13 heb in. Lê li gorî lêkolînên nû dibe ku ev jimar zêde bibe. Li jêrê pêşî li gorî rêza alfabe yê ev *Leyla û Mecnûnên* kurdî dê bên nasandin, pişt re derheqê wan de hinek analîz û nirxandin dê bên kirin.

A. LI GORÎ RÊZA ALFABEYÊ DANASÎNA *LEYLA Û MECNÛNÊN KURDÎ*

Berî ku *Leyla û Mecnûnên* kurdî yek yek bên nasandin, divê be zanîn ku di rêzkirina alfabe yê de ne nav û wesfên helbestvanan, mexles yan jî kunyeya wan bingeh hatiye girtin. Wekî nimûne di "*Leyla û Mecnûna Şêx Mihemed Canê Aqtepî*" de peyva "Aqtepî" nisbeta helbestvan e, loma jî ji ber ku ev peyv bi herfa "A" yê dest pê dike, vê *Leyla û Mecnûnê* di rêza yekem de cih girtiye.

1. *Leyla û Mecnûna Şêx Mihemed Canê Aqtepî*

Ev *Leyla û Mecnûn*, bi kurdiya kurmançî ye û di sala 1884an de ji aliyê Şêx Mihemed Canê Aqtepî ve hatiye nivîsîn. Şêx Mihemed Can kurê Şêx Hesenê Nûranî û birayê Şêx Ebdurehmanê Aqtepî ye. Di 13 Şe'ban 1274 (29 Adar 1858)an de li gundê Aqtepê ku li ser Çinara Diyarbekirê ye hatiye dinyayê û di 8 Sibat 1325 (21 Adar 1909)an de çûye ser dilovaniya Xwedê.⁴ Ev berhem ji aliyê Zeynelabidîn Zinar ve hatiye latînzekirin û çapkirin. Kêşa *Leyla û Mecnûna Şêx Mihemed Canê Aqtepî* ji behra muzariyê qalibê "Mef'ûlu mefa'ilun fe'ûlun" e ku *Mem û Zîna* Xanî jî bi vê kêşê hatiye nivîsandin. Çend beytên destpêkê û dawiyê ji vê *Leyla û Mecnûnê* ev in:

*Bi'smê te Xwedayê heyî ekber
Ewwel bikim ibtidayê defter*

*Bê îsmê te îbtîda nabe
Bê namê te name nasewab e*

4 Şêx Mihemed Can, *Leyl û Mecnûn*, amd. Zeynelabidîn Zinar, weş. Pencînar, Stockholm 1992, r. 5-6.

*Ev îsm e ku alema wicûdê
Pir îşq(i) kirî bi vê cihûdê*

*Xame lerizî li ser serî çû
Gotî ku hezar û sê sed û du*

*Yanî buhurîn ji weqtê hicret
Çêbû di wî weqtî ev hîkaye*

...

*Hem bo ruhê katibê kîtabê
Da ew pê xelas bibe j' ezabê*

2. Leyla û Mecnûna Eli Kemal Bapîr

Elî Kemal di sala 1887an de li Silêmaniyê hatiye dinyayê. Ji eşîra Caf, ji mala Îsmail Ezîzî ye. Li cem Şêx Ewlayê Hewlêrî û Mela Mihe-med Emînî Balîkeder perwerde dîtiye. Zimanê tirkî, erebî û farisî fêr bûye û bi taybetî di edebiyata farisî de gelekî pêş ketiye. Li Bexdayê û Silêmaniyê memûriyeta gumrukê kiriye. Di wextê desthilatdariya Şêx Mehmûdê Hefîd de sefîrtiya wî kiriye û bi vê wezîfeyê salekê li Îranê maye. Di wextê desthilatdariya îngilîzan de wekî katib xebitiye. Di heyata xwe de gelekî zehmetî kişandiye. Di sala 1922yan de li Silêmaniyê digel Mistefa Paşa Yamilkî, Refîq Hilmî û hin kesên di “Cemiyeta Kurdistan”ê ava kirine. Bapîr, di rojnameya *Bangî Kurdistan* a ku ji aliyê vê cemiyetê ve dihat weşandin de rojnamegerî dikir.

Gelek Helbestên wî yên hîkemî, tesewifî û neteweyî hene. Bi navê *Îdmametu Şu'eraî'l-lezîne Asertuhum, Mekru'n-Nîsa, Eş-Şu'eraul-Ek-rad el-Mensiyûn* berhemên wî yên erebî û *Diyarî Şarezûr û Baxî Mîr* berhemên wî yên kurdî hene. Bapîr, herweha *Xusrew û Şêrîn* û *Leyla û Mecnûna* Nîzamî ji farisî û *Ferhad û Şêrîn* jî ji kurdiya hewramî û wergerandine kurdiya soranî.⁵ *Leyla û Mecnûna* wî di di sala 1950î de li Bexdayê hatiye çapkirin.⁶

5 Hilmî, Refîq, *Şi'r û Edebiyatê Kurdî*, Metbe'et Te'lîmî'l-'Alî, Hewlêr 1988, r. 117-118, 135; Baban, Cemal, *E'lamu'l-Kurd*, Daru Aras, Erbil 2012, c.I, r. 371-373; Mizuri, Leyla û Mecnûna Harisê Bitlîsî”.

6 Mizuri, “Leyla û Mecnûna Harisê Bitlîsî”.

3. *Leyla û Mecnûna Mela Mehmûdê Bazîdî*

Ev *Leyla û Mecnûn*, bereksê yên dî, ne menzûm e. Di sala 1274/1858-59an de ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdî ve wekî deqekî pexşan hatiye nivîsîn. Bazîdî, ev bi destnivîsa xwe nivîsiye, pişt re A. Jaba ew derbasî tîpên latînî kiriye. Herweha Jaba digel pêşgotineke frensî, ew bi bal frensî ve wergerandiye. Kopyayêke vê destnivîsê li Parîsê li Pirtûkxaneyaya Langizo INALCO, kopyayek jî li pirtûkxaneyaya Giştî ya Lenîngradê tê parastin. Jimara destnivîsê li Lenîngradê 31 e. Di vê destnivîsê de tê gotin ku ev wergereke ji tirkî ye.⁷ A. Jaba jî gotiye ku ew wergera *Leyla û Mecnûna* Fuzûlî (m. 1560) ya bi tirkî ye. Lê Rûdenko ev *Leyla û Mecnûn* bi *Leyla û Mecnûnên* dî yên edebiyatên rojhilatê re daye ber hev û giha-ye wê encamê ku *Leyla û Mecnûna* Bazîdî, wergera pexşanî ya *Leyla û Mecnûna* Sewadî ye.

Bazîdî di vê wergera xwe de kurdiyeke sade û rojane bi kar aniye.⁸ Ev *Leyla û Mecnûn* bi hevoka “Paşê hemd û senayê cenabê hezret..” dest pê dike û bi hevoka “..qenc cenabê Xudê Te’ala deranîtin.” diqede.⁹

4. *Leyla û Mecnûna Ebdulqadir Debayan*

Ebdulqadir Debayan, ev *Leyla û Mecnûn* ji zimanê tirkî wergerandiye kurdiya goranî/hewramî. Berhem, di sala 1985an de ji aliyê Mihe-med Emîn Hewramanî ve li Bexdayê hatiye çapkirin.

5. *Leyla û Mecnûna Mela Mihemedê Hezanî*

Leyla û Mecnûneke dî ku bi kurdiya kurmancî û bi nezmê hatiye nivîsîn, a Mela Mihemedê Hezanî ye. Mela Mihemedê ku di sala 1939an de li gundê Hezanê yê Liceya Diyarbekirê hatiye dinyayê, li cem bavê xwe Mela Ebdulxefûr û Seydayê Xasî yê Hezanî dest bi perwerdeyê kiriye. Di sala 1949an de dibîstana seretayî ya fermî ya ku nû li Hezanê vebûbû xilas kir. Pişt re li Diyarbekirê li cem Mela Ebdusemed û li Liceyê li cem Mela Ebdullah perwerdeya xwe domandiye. Herweha li gundên

7 Navê berhemê weha hatiye nivîsîn: “Kîtabê tercemeyê *Leyla Mecnûnê* Tirkî bi Zimanê Ekrad û Kurmancîye.” (Bnr. Rudenko, M. B., *Opisanie Kurdish Rukopisy Leningradskii Sobranie*, Izdatelbstvo Vdstdçndy Literaturi, Moskova 1961, r. 63.)

8 Pîrbal, Ferhad, *Mela Mehmûdê Bayezîdî (1799-1867) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, weş. Aras, Hewlêr, 2000, r. 169; Cevdet Huşyar, “Zexairu’t-Turasi’l-Kurdî fî Xezaini Petersburg”, <http://www.fnrtop.com/vb/showthread.php?t=712891> (15.08.2014)

9 Rudenko, *Opisanie Kurdish Rukopisy Leningradskii Sobranie*, r. 64.

Diyarbekirê yê wekî Kengelî, Metranî û Baroglu jî perwerde dîtiye. Piştî leşkeriyê di sala 1969an de dest bi melatiya fermî kiriye. Mela Mihemedê Hezanî niha li Diyarbekirê dijî.¹⁰

Mela Mihemedê ku di helbestên xwe de mexlesa “Mem” û “Mîm”ê bi kar tîne, helbestên xwe yê pêşî di sala 1958an de nivîsandine. Nivîskar, ji bilî *Leyla û Mecnûnê* yek bi kurdiya kurmancî, yek jî bi kurdiya dimilî du menzûmeyên derheqê “Eqîdeya Îmanê” de nivîsine û ji bilî van çendîn helbestên wî jî hene. *Leyla û Mecnûn* jî di nav de herdu eqîdeyên wî digel 7 helbestên wî di sala 1982yan de ji aliyê Mela Zeynelabidin Amidî ve hatine îstînsaxkirin û wekî mecmû’eyekê hatine komkirin.¹¹ Kêşa *Leyla û Mecnûna* Mela Mihemedê Hezanî ji behra muzariyê qalibê “Mef’ûlu mefa’ilun fe’ûlun” e ku *Mem û Zîna* Xanî jî bi vê kêşê hatiye nivîsandin. Beytên wê yê destpêkê û dawiyê ev in:

*Navê te bi ser namê temaman
Rehman sîfet î rehîmi naman*

*Nîşan bi Mîm î Mihemed nav î
‘Aşiq bi ax î bêcan û gav î*

6. *Leyla û Mecnûna* Hacî Ebdulfettahê Hezroyî

Ev *Leyla û Mecnûn* jî menzûm e û bi kurdiya kurmancî ye. Nivîskarê wê Seydayê Hecî (Hacî Ebdulfettahê Hezroyî) ye. Seydayê Hecî, di sala 1892yan de li gundê Zuhûrê yê Hezroyê hatiye dinyayê û di sala 1975an de li heman cihê koçî dawiyê kiriye. Seydayê ku li Hezroyê ji 50 salî zêdetir dersdarî kiriye, ji bilî *Leyla û Mecnûnê* gelek berhemên di jî dane.¹²

Leyla û Mecnûna Hacî Ebdulfettahê Hezroyî di nav dîwana wî de cih girtiye. Dîwana wî jî ji aliyê Mela Zeynelabidîn Amidî ve hatiye ama-

10 Adak, Abdurrahman, “Liceli Şairlere Genel Bir Bakış”, *Dünden Bu Güne Lince Sempozyumu Bildirileri*, weş. Mardin Artuklu Üniv., Mardin 2012, r. 437-438.

11 Hezanî, Mela Mihemedê, *Mecmû’ya Menzûmeyan*, berhevkar: Zeynelabidîn Amidî, Kopyaya li pirtûkxaneyê Abdurrahman Adak.

12 Yalar, Mehmet, “Hazrolu Abdulfettah Yazıcı ve Şairliği”, *Uluslararası Silvan Sempozyumu*, weş. Mardin Artuklu Üniv., Mardin 2012, r. 459-468; Ergin, M. Cevat, “Hazrolu Seyda Hacî Abdulfettah Yazıcı”, *D.Ü. İlh. Fak. Dergisi*, c.VIII, j.1 (2006), r. 109-130; Selim Temo, *Kürt Şiiri Antolojisi*, weş. Agora, İstanbul, 2007, c.II, r. 1443; Adak, “Liceli Şairlere Genel Bir Bakış”, r. 430-431.

dekirin û çapkirin. Ev *Leyla û Mecnûn*, ji çend beşên pêşî pêk hatiye û beşên dawî tê de nînin. Kêşa wê ji behra hezecê qalibê “Mefa’îlun mefa’îlun fe’ûlun”e. Beyta yekem a vê *Leyla û Mecnûnê* weha ye:¹³

*Dema salarê mulkê subhegahî
Ku rûniştî li textê padişahî*

7. *Leyla û Mecnûna Ebdulcebbar Axayî Kanî*

Ebdulcebbar Axayî Kanî di sala 1902yan de li Hêwlêrê hatiye dinyayê. Perwerdeya nîzamî nedîtiye, lêbelê xwe gelekî pêş ve biriye. di sala 1957an de dîsa li Hewlêrê koçî dawiyê kiriye. Berevajiyê malbata xwe bûye xwediye hizreke neteweyî. Kanî, gelek helbestên lîrîk û neteweyî nivîsandine. Lêbelê helbestên wî yên lîrîk zêdetir in. Di van helbestan de mexlesa Kanî bi kar aniye. Wî herweha *Leyla û Mecnûneke* tirkî bal bi kurdiya soranî ve wergerandiye.¹⁴ *Leyla û Mecnûna* Kanî li Hewlêrê hatiye çapkirin (çapa duyem 1969).¹⁵

8. *Leyla û Mecnûna Mela Mihemedê Qulî Kendûleyî*

Bi qasî ku tê zanîn ev *Leyla û Mecnûn*, yekem *Leyla û Mecnûn* e ku di edebiyata kurdî de hatiye nivîsîn. Tarîxa nivîsîna wê sala 1145/1732 ye. Nivîskarê wê Mela Mihemedê Qulî Kendûleyî ye ku xelkê Kurdistanê Rojhilat e. *Leyla û Mecnûna* Kendûleyî, bi kurdiya goranî/hewramî hatiye nivîsandin. Du nuxzeyên wê li Kirmanshah (îstînsax: 1870) û Mehabadê (îstînsax: 1879) ji aliyê rojhilatnasê Almanî Oscar Mann ve bi riya kirîne hatine bidestxistin. Ev *Leyla û Mecnûn* heta niha nehatiye çapkirin. Lêbelê ji ber ku ev *Leyla û Mecnûn* bi kurdiya hewramî hatiye nivîsîn, dikare bê gotin ku ji aliyê ruxsarê ve taybetiyên edebiyata hewramî di xwe de dihewîne û bi kêşa xwemalî û deh birgeyî hatiye nivîsandin.¹⁶

9. *Leyla û Mecnûna Mîrza Şefî’ê Kulyayî*

Mîrza Şefî’ê Camerêzî Kulyayî, xelkê Kurdistanê Rojhilat e û di navbera salên 1200/1785-1250/1834an de jiyana xwe bûrandiye. Kulyayî,

13 Hezroyî, Hacî Ebdulfettahê, “Dîwan”, *Selasû Mennzûmat*, amd. Zeynelabidîn Amidî, Diyarbekir 2004.

14 Baban, *E’lamu’l-Kurd*, r. 378-379.

15 Şêx Mihemed Can, *Leyl û Mecnûn*, r. 5.

16 Xeznedar, *Mêjuwî Edebî Kurdî*, c.II, r. 507.

wekî munşiyê xanên Erdelanê wezîfe kiriye. Hevaltiya wî bi Xanay Qubadî re hebûye û ji hev re helbest nivîsîne.¹⁷

Li gorî agahiyên ku Abdulrehman Mizuri dide, nusxeyek ji *Leyla û Mecnûna* Kulyayî bi destê Mîrza Qulî Hersînî di sala 1320/1902yan de hatiye zêdekirin û ev nusxe di Pirtûkxaneya Marburgê de li bajêrê Berlîn hatiye parastin. Ev *Leyla û Mecnûn* bi kurdiya goranî/hewramî hatiye nivîsandin..¹⁸

Di nîsbetkirina *Leyla û Mecnûnê* bi bal Mîrza Şefî'ê Kulyayî ve nêrîneke Xeffar Îbrahîmî jî heye ku li gorî wî gelek helbestên Xanay Qubadî bi bal kesên di ve hatine nîsbetkirin û bi heman rengî *Leyla û Mecnûna* wî jî bi navê “Newfel û Mecnûn” bi bal Mîrza Şefî'ê Kulyayî ve hatiye nîsbetkirin û ev nusxe ji aliyê Emîn Kucerî Şaho ve bi navê “Kitêbî Newfel Şa û Mecnûn” wekî berhema Mîrza Şefî'ê Kulyayî hatiye çapkirin. Lêbelê Îbrahîmî hebûna cudahiyên di navbera metnên wan de jî îfade kiriye.¹⁹ Bi hizra me ji bo ku ev mijar zelal bibe divê nusxeya Marburgê jî di nav de hemû nusxeyên *Leyla û Mecnûnê* ku bi Kulyayî ve tên nîsbetkirin bên komkirin û piştî muqayeseya bi *Leyla û Mecnûna* Qubadî re encama rast bê bidestxistin.

10. *Leyla û Mecnûna* Xanay Qubadî

Xanay Qubadî, di sala 1673yan de li Kurdistana Rojhilat li gundê Derne ku li ser Ciwanrûyê ye hatiye dinyayê. Qubadî, ji eşîra Bacalan e û bi îhtîmaleke mezin jî malbata birêvebirên gundê Derne ye. Hevaltiya wî bi munşiyê xanên Erdelanê Mîrza Şefî'î Kulyayî hebûye û ji hev re gelek helbest nivîsîne. Qubadî, di serdema Nadirşahê Sefewî de jiyaye û gihîştîye serdema Qaçariyan. Qubadî, temenekî dirêj bûrandîye û bi îhtîmaleke mezin di sala 1754 de koçî dawiyê kiriye.

Qubadî, di warê edebiyata klasîk de berhemên edebî yê hêja dane. Pêşî *Xusrew û Şîrîn*, pişt re jî di sala 1741ê de *Leyla û Mecnûn* nivîsiye. Qubadî, ev berhemên xwe bi saîqa hizra neteweyî nivîsandine. Berhemên wî bi kurdiya goranî hatine nivîsîn. Qubadî, di berhemên xwe de li pey şopa Camî û Nîzamiyê Gencewî çûye. *Leyla û Mecnûna* Qubadî ji aliyê ruxsarê ve li gori taybetiyên xwemalî û bi kêşa dehbirgeyî hatiye nivîsandin.²⁰ Destpêk û dawîya *Leyla û Mecnûna* wî weha ye:

17 Îbrahîmî, Xeffar, *Xanay Qubadî Leyla û Mecnûn*, Binkey Jîn, Silêmanî 2011, r. 27.

18 Mizuri, “*Leyla û Mecnûna* Harisê Bitlîsî”.

19 Îbrahîmî, *Xanay Qubadî Leyla û Mecnûn*, r. 30.

20 Îbrahîmî, h.b., r. 25-29; Xeznedar, *Mêjuwî Edebî Kurdî*, c.II, r. 89-94.

*Be namî ew kes be “Kun feyekûn”
‘Alemeş ce ketm ‘edem kerd bîrûn*

*Mehzî xatiran Seyyidu’l-kewneyn
Muhemmed Fatih Xeyber û Huneyn*

*Hezar û şeş sed û çil û çîwar bêten
Pey dostan ne bo xane pey kêten*

*Sed hezar sel’wat xatimey kelam
Be Rewzey Resûl ‘eleyhi’s-salam*

11. Leyla û Mecnûna Sewadî

Sewadî, mexlesa helbestvanê me ye ku wî di *Leyla û Mecnûna* xwe de sê caran ev mexles bi kar aniyê. Li jêrê beytek ji wan cih digire:

*Ya Rebbî **Sewadiyê** cigêrxûn
Azade bikey bibexşî Mecnûn*

Di çavkaniyan de navê Sewadî wekî “Haris” û devera wî jî wekî Bedlîs hatiye nîşandan û ji Sewadî zêdetir wekî “Harisê Bedlîsî” behsa wî hatiye kirin.²¹

Ji van beytên jêrîn ku di destpêka *Leyla û Mecnûnê* de nivîsandine, derdikeve meydanê ku Sewadî di sedsala hijdehem de jiyaye:

*Nehroz(i) temami, paşê newroz
Menqûş(i) mi kir nigînê pîroz*

*Mexzê dev û lêv se’yê sinne
Tarîx ji wî lew ji mexzê sinne*

Ji beyta pêşî aşîkar dibe ku nivîskar berhema xwe piştî Newrozê bi deh rojan nivîsandiye. Ev jî beramberî 31ê Adarê tê. Ji beyta duyem jî ji îfadeya “mexzê sine” bi hesabê Ebcedê tê fêhmkirin ku sala nivîsandinê

21 Rudenko, *Opisanie Kurdish Rukopisy Leningradskii Sobranie*, r. 61-62; Qanatê Kurdo, *Tarîxa Edebyeta Kurdî*, weş. Öz-ge, Ankara 1992, r. 122.; Mizuri, “Leyla û Mecnûna Harisê Bitlîsî”; Xeznedar *Mêjuwî Edebî Kurdî*, c.II, r. 507; Doskî, Tehsîn Î., *Harisê Bedlîsî Leyla û Mecnûn*, weş. Spîrêz, Hewlêr 2004, r. 3, 14, 36; Sağnîç, Feqî Huseyn, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2002, r. 417; Temo, *Kürt Şiiri Antolojisi*, c.II, r. 1374.

1162 (bi mîladî 1748) e. Bi vî awayî tarîxa nivîsandina vê berhemê dibe 1161/31ê Adara 1161ê hicrî ku beramberî sala 1748ê tê. Lê ji ber ku di hinek nusxeyan de peyva “sinne”yê wekî “sîne”yê jî hatiye nivîsandin, eger em hesabê Ebcedê li gorî vê çêkin, wê demê tarîx bi zêdebûna 10 salan dê bibe 1172 (bi mîladî 1758).²²

Naxwe eger Sewadî, di sala 1748, yan jî 1758an de berhema xwe nivîsandibe, ev lazimî xwe dike ku ew di vê tarîxê de bi hindikayî serdema zaroktiyê û perwerdeyê xilas kiriye. Ji xwe di hinek çavkaniyan de hatiye neqlkirin ku sala bûyîna wî 1700 yan jî 1738 e.²³

Sewadî, helbestvanekî gelekî bi hêz e. Wî digel çendîn helbestan du mesnewiyên evîndariyê jî nivîsandine: *Leyla û Mecnûn* û *Yûsif û Zelîxa*. Bêguman berhema wî ya herî girîng *Leyla û Mecnûn* e. *Leyla û Mecnûna* Sewadî heta niha sê caran çap bûye. Cara pêşî M. B. Rudenko di sala 1965an de bi elîfbêya rûsî û bi pêşgotina xwe çap kiriye. Wê di edisyona wê de ji nusxeyeke ku li Pirtûkxaneyaya Lenîngradê hatibû parastin sûd wergirtiye²⁴. Berhem, cara duyem di sala 1999an de li Stenbolê ji aliyê weşanxaneyaya Nûbiharê ve hatiye çapkirin.²⁵ Di vê çapê de ji nusxeya Hacî Feyrûz sûd hatiye wergirtin. Herî dawî jî di sala 2004an de ji aliyê Tehsîn Îbrahîm Doskî ve li Dihokê hatiye çapkirin. Di nav van hersê çapan de ya herî zêde xwedî bingeş ev çap e. Lewra Doskî di vê çapê de digel herdu çapên berî xwe ji destnivîseke cuda jî sûd wergirtiye. Ev jî destnivîsa Remezanê kurê Seyîd Silêman e. Ev kes xelkê Kurdistanê Sûriyeyê ye û nusxeya xwe di sala 1400/1979î de li ber nusxeyeke kevin zêde kiriye.²⁶

Sewadî, *Leyla û Mecnûna* xwe îthafî du mîr/begên bi navê Emînê Yûsif û kurê wî Ebdullah Xan kiriye. Li gorî ku Sewadî xelkê Bedlîsê ye, dibe ku ev herdu mîr/beg jî malbata Şerefxaniyên desthilatdarê mîrek-tiya Bedlîsî bin.

22 Kurdo, h.b., r. 123; Mizuri, h.g.; Doskî, h.b., r. 17-18.

23 Ji bo jiyana helbestvan bnr. Doskî, h.b., r. 7-19; Temo, *Kürt Şiiri Antolojisi*, c.II, r. 1374, Abdulhadi Timurtaş, “Haris el-Bitlîsî ve Leyla û Mecnûn Adlı Manzûmesi” *I. Uluslar arası Diünden Bugüne Tatvan ve Çevresi Sempozyumu Bildirileri*, weş. Beyan, İstanbul 2008, r. 373.

24 Huşyar, behsa destxeteye *Leyla û Mecnûnê* ku jimareya wê Kurd 30 e û 24 fêsl, û 564 beyt in dike. Dibe ku nusxeya ku Rudenko bingeş girtiye ev be. Bnr. Huşyar, “Zexairu’t-Turasi’l-Kurdî fi Xezaini Petersburg”.

25 Siwadî, *Leyla û Mecnûn*, amd. M. Reşîr Irgat, Selman Dilovan, weş. Nûbihar, Stenbol 1999, r. 139.

26 Doskî, *Harisê Bedlîsî Leyla û Mecnûn*, r. 19.

Leyla û Mecnûna Sewadî ji teşeyên nezmê bi teşeya mesnewiyê hatiye nivîsandin. Loma jî her beyteke wê di nav xwe de bi qafiye ye. Bi gotineke di herdu misra'ên her beytekê hemqafiye ne. Hijmara beytên wê li gor nusxeya Nûbiharê 771 e. Berhem li ser wezna erûzê ji behra Hezecê bi qalibê “Mef’ûlu mefa’îlun fe’ûlun” hatiye nivîsandin. Ev qalib her weha qalibê *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî ye.

Destpêk û dawiya *Leyla û Mecnûna* wî weha ye:

*Fihristê kitabê navê Me’bûd
Qeyyûm û Qedîm û Heyy û Mewcûd*

*Bê şubh û mîsal û ‘Edl û Xaliq
Sazendeê mumkînat û faliq*

*Bê ewwel û axir û ‘Ezîm î
Wehhab û Kerîm î û Rehîm î*

*Mame di xema xwe da îlahî
Çar û mededa me rûsiyahî*

*Mewta mi heq e û ez newêrim
Lewra gunehê ‘ecêb didêrim*

*Rakî li mi key we min riha key
Bo xatirê alê Mustefa key*

12. *Leyla û Mecnûna* Mela Fercî Salih Şekîb

Ev *Leyla û Mecnûn*, di sala 1942yan de ji aliyê Mela Fercî Salih Şekîb ve ji *Leyla û Mecnûna* Nîzamiyê Gencewî ya farisî bi bal kurdiya soranî ve hatiye wergerandin û di sala 1969an de li Bexdayê hatiye çapkirin.²⁷

13. *Leyla û Mecnûna* Mela Weledxan

Mela Weledxan, di navbera 1825-1885an de jiyaye. Nusxeyek ji *Leyla û Mecnûna* wî bi destê Mela Riza di sala 1880yî de hatiye nivîsîn û di pirtûkxaneyê Marburgê de li bajarê Berlînê hatiye parastin. *Leyla û Mecnûna* Mela Weledxan bi kurdiya goranî/hewramî hatiye nivîsandin.²⁸

27 Mizuri, “*Leyla û Mecnûna* Harisê Bitlîsî”.

28 Mizuri, h.g.

B. ANALÎZ Û NIRXANDINEKE GIŞTÎ LI SER LEYLA Û MECNÛNÊN KURDÎ

Di vê beşê de ji aliyê kronolojî, zarave, nezm û pexşan, telîf û werger û girîngiyê ve dê li ser *Leyla û Mecnûnên* kurdî yên ku li jorê hatin nasandin hinek dabeşkirin, analîz û nirxandin bên kirin. Divê bê zanîn ku encamên ku hatine bidestxistin, li ser bingeha her sêzdeh *Leyla û Mecnûnên* navborî hatine saz kirin. Eger ji niha şûn de hin *Leyla û Mecnûnên* di bên peydakirin, wê demê divê ew jî li ber çavan bîn girtin.

1. Li Gorî Kronolojiyê *Leyla û Mecnûnên* Kurdî

Eger *Leyla û Mecnûnên* kurdî bi awayekî kronolojîk bîn rêzkirin (li gorî salên nivîsandina wan, eger ew neyê zanîn li gorî koça dawî ya nivîskarên wan, yan jî li gorî îstînsaxa desxeta wan) tabloyeke weha derdikeve meydanê.

JMR	BERHEM	ZARAVE	SAL	SEDSAL
1.	Mela Mihemedê Qulî Kendûleyî	Hewramî	nivîsîn: 1732	Sedsal: XVIII
2.	Xanay Qubadî	Hewramî	nivîsîn: 1741	
3.	Sewadî	Kurmancî	nivîsîn: 1748 yan jî 1758	
4.	Mîrza Şefî'ê Kulyayî	Hewramî	nivîsîn: 1834	Sedsal: XIX
5.	Mela Mehmûdê Bazîdî	Kurmancî	nivîsîn: 1858	
6.	Şêx Mihemed Canê Aqtepî	Kurmancî	nivîsîn: 1884	
7	Mela Weledxan	Hewramî	k.d. 1885	Sedsal: XX
8	Mela Fercî Salih Şekîb	Soranî	nivîsîn: 1942	
9	Eli Kemal Bapîr	Soranî	nivîsîn: 1950	
10	Ebdulcebbar Axayî Kanî	Soranî	çapa duyem: 1969	
11	Hacî Ebdulfettahê Hezroyî	Kurmancî	k.d. 1975	
12	Mela Mihemedê Hezanî	Kurmancî	îstînsax: 1982	
13	Ebdulqadir Debayan	Hewramî	nivîsîn: 1985	

Tablo 1: Li Gorî Kronolojiyê *Leyla û Mecnûnên* Kurdî

Çawa ku tê dîtin di tarîxa edebiyata kurdî de, di çarçoveya agahiyên berdest de, *Leyla û Mecnûnên* pêşî di sedsala XVIIIem de hatine nivîsîn. Di vê sedsalê de bi kurdî sê heb *Leyla û Mecnûn* hene. Ji van

a herî kevin, *Leyla û Mecnûna* Mela Mihemedê Qulî Kendûleyî ye ku di sala 1732yan de hatiye nivîsîn. Loma jî di tarîxa edebiyata kurdî de yekemîn *Leyla û Mecnûn* ev e. Ev *Leyla û Mecnûn* û *Leyla û Mecnûna* Xanay Qubadî (1741) li pey hev li Kurdistana Rojhilat bi kurdiya hewramî hatine nivîsîn. Piştî wan bi demeke kurt (1748, yan jî 1758) îcar *Leyla û Mecnûnek* (Sewadî) bi kurdiya kurmançî hatiye nivîsîn. Hersê *Leyla û Mecnûn* jî di nîveka pêşî jî sedsala XVIIIem de di navbera 16 yan 26 salan de hatine nivîsîn. Loma hersê jî aîdê heman demê dikarin bên hesibandin. Di vê sedsalê de bi kurdiya soranî û kurdiya dimilî *Leyla û Mecnûn* nehatine nivîsîn. Ji ber ku hewramî û kurmançî du zaraveyên edebî yên herî kevin ên edebiyata kurdî ne, *Leyla û Mecnûnên* pêşî jî bi van du zaraveyan hatine nivîsîn.

Nivîsîna *Leyla û Mecnûnên* kurdî piştî sedsala XVIIIem bi îstîqrar dom kiriye û her ku çûye zêdetir jî bûye. Jimara *Leyla û Mecnûnên* ku di sedsala XIXem de hatine nivîsîn bûye çar. Ev her çar jî di maweya salên 1834-1885an de hatine nivîsîn. Du heb ji wan bi kurdiya kurmançî (Mela Mehmûdê Bazîdî, Şêx Mihemed Canê Aqtepî), du heb jî bi kurdiya goranî/hewramî (Mîrza Şefî'ê Kulyayî, Mela Weledxan) ne.

Jimara *Leyla û Mecnûnên* ku di sedsala XXem de hatine nivîsîn gihîştîye şeşan. Ev her çar jî di maweya salên 1942-1985an de hatine nivîsîn. Cara pêşî di vê sedsalê de *Leyla û Mecnûnên* bi kurdiya soranî têne dîtîn ku ew jî werger in (Mela Fercî Salih Şekîb, Eli Kemal Bapîr, Ebdulcebbar Axayî Kanî). Ji yên mayî du heb bi kurdiya kurmançî (Hacî Ebdulfettahê Hezroyî) ne û hebeke jî bi kurdiya hewramî (Ebdulqadir Debayan) ye.

2. Li Gorî Zaraveyan *Leyla û Mecnûnên* Kurdî

Eger *Leyla û Mecnûnên* kurdî li gorî zaraveyên kurdî bên dabeşkirin tabloyeke weha derdikeve holê:

	Kurdiya Hewramî	Kurdiya Kurmançî	Kurdiya Soranî
1.	Mela Mihemedê Qulî Kendûleyî	Harisê Bedlîsî	Mela Fercî Salih Şekîb
2.	Xanay Qubadî	Mela Mehmûdê Bazîdî	Eli Kemal Bapîr
3.	Mîrza Şefî'ê Kulyayî	Şêx Mihemed Canê Aqtepî	Ebdulcebbar Axayî Kanî
4.	Mela Weledxan	Hacî Ebdulfettahê Hezroyî	-
5.	Ebdulqadir Debaya	Mela Mihemedê Hezanî	-

Tablo 2: Li Gorî Zaraveyên Kurdî *Leyla û Mecnûnên* Kurdî

Eger tablo bê analîzkirin dê bê dîtin ku di navbera *Leyla û Mecnûnên* bi kurdiya hewramî û kurmancî û yê bi kurdiya soranî de cudahiye mezî hene. Lewra hem di zaraveyê hewramî, hem jî di yê kurmancî de 5 heb, lêbelê di zaraveyê soranî de 3 heb *Leyla û Mecnûn* hatine nivîsîn. Hem di zaraveyê hewramî, hem jî di yê kurmancî de *Leyla û Mecnûnên* pêşî di sedsala XVIIIem de ne, lê di zaraveyê soranî de di sedsala XXem de ne. Cudahiyêke dî jî di navbera wan de ev e, *Leyla û Mecnûnên* di zaraveyê hewramî û kurmancî de telîf, yê di zaraveyê soranî de werger in.

Çawa ku tê dîtin zaraveyê kurmancî û hewramî di dahênana *Leyla û Mecnûnan* de ji zaraveyê soranî dewlemendtir in. Eger li tarîxa edebiyata van zaraveyan û rengên wan ên edebî bê nêrîn ji bo vê yekê du sedem dikarin bîn nîşandan. Yê pêşî li gorî hewramî û kurmancî dereng destpêkirina edebiyata kurdiya soranî ye. Çawa ku tê zanîn bi awayê nivîskî edebiyata kurdiya hewramî di sedsala XVem, edebiyata kurdiya kurmancî jî di sedsala XVIem, lê edebiyata kurdiya soranî di nîveka duyem a sedsala XIXem de dest pê kiriye. Paralelî vê yekê nivîsîna mesnewiyê *Leyla û Mecnûnê* jî di edebiyatê kurdiya hewramî û kurmancî de zû, di edebiyata kurdiya soranî de dereng dest pê kiriye. Sedemê duyem jî ew e ku ji aliyê teşeyê berhemên edebî û cureyê edebî ve di edebiyatê kurdiya hewramî û kurmancî de li kêleka dîwan û xezel û qesîdeyê di nav wan dîwanan de çîrokên evîndariyê yê bi terzê mesnewiyê jî hatine dayîn. Lêbelê di edebiyata kurdiya soranî de rengê zal dîwan û xezel û qesîdeyê di nav wan dîwanan de ne. Di vê edebiyatê de terzê mesnewiyê evîndariyê zêde pêş neketiye. Loma jî *Leyla û Mecnûnên* telîf nehatine nivîsîn.

3. Li Gorî Şêweyê (Nezm û Pexşan) *Leyla û Mecnûnên* Kurdî

Di edebiyata klasîk de xwezaya çîrokên evîndariyê ew e ku bi şêweyê nezmê (bi awayekî menzûm) û bi teşeya mesnewiyê bîn nivîsandin. *Leyla û Mecnûnên* kurdî jî, di nav atmosfera serdema klasîk de, bi şêweya nezmê û bi teşeya mesnewiyê hatine nivîsîn. Di nav her 13 *Leyla û Mecnûnan* de tenê ya Mela Mehmûdê Bazîdî bi şêweya pexşanê ye. Divê bê gotin ku di nivîsîna vê *Leyla û Mecnûna* pexşan de Bazîdî ne ku li pey kevneşopiyekê çûye, wî rewşeke îstîsnaî derxistiye meydanê. Bazîdî wekî pexşannûsê herî girîng ê tarîxa edebiyata kurdî, gelek berhemên pexşan nivîsandine. Di vê navberê de mesnewiyê evîndariyê yê ku ji aliyê muellîfê berî wî ve bi awayê nezmê hatine nivîsandin jî

derbasî pexşanê kirine û di vê çarçoveyê de *Leyla û Mecnûna* pexşan jî derketiye meydana. Loma jî ne berî Bazîdî, ne jî piştî wî *Leyla û Mecnûne* ke pexşan nehatiye nivîsîn.

4. Li Gorî Orjînalîteyê (Telîf û Werger)

Leyla û Mecnûnên Kurdî

Di edebiyata klasîk de heman çîroka evîndariyê, digel hinek cuda-hiyên biçûk, ji aliyê gelek kesan ve û bi zimanên cur bi cur tînin nivîsîn. Ev taybetiyeke edebiyata klasîk e. Loma jî dema helbestvanek, *Leyla û Mecnûna* ku di zimanê erebî, farisî, tirkî û urdû de jî hatiye nivîsîn, di zimanê kurdî de ji nû ve bi îfade û uslûba xwe binivîse, ew *Leyla û Mecnûn* ne wekî werger, wekî telîf tê hesibandin. Hetta eger peyva “tercume”yê hatibe bikaranîn jî, divê “tercume” (werger)a îroyîn a lîteral neyê fêmkirin. Bo nimûne *Leyla û Mecnûna* Sewadî ku dibêje “ew tercumeya ji farisî ye” di vê kategoriyê de ye. Li vir mebesta nivîskar ji peyva “tercume”yê, bi ziman û uslûbeke nû ji nû ve nivîsandina mijarên berhema orjînal e. Ji bo ku *Leyla û Mecnûnek* wekî werger bê hesibandin, divê werger, wergera lîteral be. Di wergerên lîteral de xala herî girîng ew e ku helbestvan, bi jimara beytên berhema orjînal ve girêdayî bimîne; ne tiştêkî kêmbihêle, ne jî lê zêde bike.

Di vê çarçoveyê de ji van her 13 *Leyla û Mecnûnan* 9 heb telîf, 4 heb jî werger in. Her çar *Leyla û Mecnûnên* werger jî di sedsala XXem de hatine nivîsandin. Ev jî nîşan dide ku tîkiliya derketina wergerên lîteral û serdema modern bi hev re hene. Ji van *Leyla û Mecnûnên* werger sê heb bi kurdiya soranî ne, hebeke jî bi kurdiya hewramî ye. Ji van *Leyla û Mecnûnan* ên Mela Fercî Salih Şekîb û Eli Kemal Bapîr ji farisî; yê Ebdulcebbar Axayî Kanî û Ebdulqadir Debayan jî ji tirkî hatine wergerandin.

5. Li Gorî Girîngiyê *Leyla û Mecnûnên* Kurdî

Li gorî doneyên di dest de dikare bê gotin ku di nav her 13 *Leyla û Mecnûnên* kurdî de ji aliyê girîngiyê ve du heb ji wan ji yê dî zêdetir derdikevin pêş. Ew jî *Leyla û Mecnûnên* Xanay Qubadî û Sewadî ne. Ji bo gihîştina vê encamê çend kriter li ber çavan hatine girtin. Kritera yekem ew e ku ji aliyê orjînalîteyê ve berhem ne werger, lêbelê telîfa orjînal be. Ya duyem ew e ku berhem ji aliyê kronolojiyê ve ji nimûneyên kevin be (kriter a qidemê). Ya sêyem ew e ku berhem xwediyê estetîkeke edebî û hin taybetiyên xweser be. Ya çarem ew e ku berhem ne kêmbê, tam be.

Dema em li gorî van krîteran li *Leyla û Mecnûnên* kurdî dinêrin, em dibînin ku *Leyla û Mecnûnên* Mela Fercî Salih Şekîb, Eli Kemal Bapîr, Ebdulcebbar Axayî Kanî û Ebdulqadir Debayan ne telîfên orjîlan in, werger in. *Leyla û Mecnûna* Mela Mehmûdê Bazîdî, her çiqas ji aliyê ku pexşan e girîngiyê xwe ya taybet heye jî, lêbelê ji ber ku kurteyêke biçûk a *Leyla û Mecnûna* Sewadî ye, ew jî ne orjînal e. *Leyla û Mecnûna* Mîrza Şefî'ê Kulyayî jî ji aliyê hinek lêkolîneran ve wekî versiyoneke *Leyla û Mecnûna* Xanay Qubadî tê qebûl kirin. Dema em van *Leyla û Mecnûnên* ku ne li gorî krîtera orjînalîteyê ne bidin aliyekî, îcar dor tê ku em li gorî krîtera qîdemê/kevinahiyê li *Leyla û Mecnûnên* mayî binêrin. Ji ber ku yên mayî yan bi kurdiya kurmancî, yan jî bi kurdiya goranî/hewramî ne, divê ev krîter ji bo herdu kategoriyan cihê cihê bê tetbîq kirin.

Di nav *Leyla û Mecnûnên* bi kurdiya kurmancî de ya herî kevin *Leyla û Mecnûna* Sewadî ye. *Leyla û Mecnûna* Sewadî di serdema mîrektiyan de, yên dî di serdema piştî mîrektiyan de hatine nivîsandin. Di dawiya Osmaniyan de *Leyla û Mecnûna* Şêx Mihemed Canê Aqtepî hatiye nivîsandin ku ew jî di nav yên orjînal de ji aliyê qîdemê/kevinahiyê ve di pileye duyem de ye. Heçî *Leyla û Mecnûna* Hacî Ebdulfettahê Hezroyî ye, ew jî ber ku ne tam e derveyî nirxandinê dimîne.

Di nav *Leyla û Mecnûnên* bi kurdiya goranî de ya herî kevin *Leyla û Mecnûna* Mela Mihemedê Qulî Kendûleyî ye. Lê ji ber ku Xanay Qubadî jî hevdemê wî ye, *Leyla û Mecnûna* wî jî di kategoriya *Leyla û Mecnûnên* herî kevin ên kurdiya goranî/hewramî de dikare bê qebûl kirin. Ji van herdu *Leyla û Mecnûnan* her çiqas a Mela Mihemedê Qulî Kendûleyî neketiye destê me jî, lê ji belavbûna *Leyla û Mecnûna* Qubadî dikare bê texmînkirin ku giraniya *Leyla û Mecnûna* Qubadî zêdetir e. Piştî *Leyla û Mecnûna* Qubadî û Kendûleyî di sedsala XIXem de *Leyla û Mecnûna* Mela Weledxan hatiye nivîsandin û ev jî ji aliyê qîdemê/kevinahiyê ve di pileye duyem de ye.

Ji aliyê estetîk û hêza edebî ve her çiqas bi rehetî dikare bê gotin ku *Leyla û Mecnûna* Sewadî jî û ya Xanay Qubadî jî qet nebe ji yên dî ne kêmtir in û bandoreke mezin jî li pey xwe hiştine, lê dîsa jî ji bo ku estetîka berhemana û hêza edebî ya nivîskarên wan rast bê tesbîtkirin divê hin xebatên cuda ji bo vê mijarê bînin terxankirin.

Piştî van nirxandinan dikare bê gotin ku di nav *Leyla û Mecnûnên* orjînal yên bi kurdiya kurmancî de ya herî girîng *Leyla û Mecnûna* Sewadî, piştî wê jî ya Şêx Mihemed Canê Aqtepî ye. *Leyla û Mecnûna*

Hacî Ebdulfettahê Hezroyî, digel ku gelekê edebî ye jî ne tam e. Loma jî piştî *Leyla û Mecnûna* Aqtepî ya Mela Mihemedê Hezanî dikare di rêza sêyem de bê hesibandin. Heçî *Leyla û Mecnûnên* bi kurdiya goranî/hewramî ne, di nav wan de di pileya yekem de yên Xanay Qubadî û Mela Mihemedê Kendûleyî, pişt re jî ya Mela Weledxan tê ku di sedsala XIXem de hatiye nivîsandin.

ENCAM

1. Bûyera evîndariya *Leyla û Mecnûnê* di sedsala VIIem de li Necdê qewimiye. Helbestên ku Mecnûn di wan de behsa serpêhatiya evîndariya xwe dike cara pêşî di edebiyata erebî de di sedsala XIem de wekî dîwanekê hatine komkirin. Lê berhema herî zêde edebî û navdar di edebiyata farisî de ji aliyê Nîzamiyê Gencewî ve hatiye nivîsandin (sedsal XII). Piştî Nîzamî, li pey rêça wî bi zimanên farisî, tirkî û urdû gelek mesnewiyên *Leyla û Mecnûnê* hatine nivîsandin.

2. *Leyla û Mecnûna* ku di edebiyata klasîk a gelên rojhilatê yên misliman de ji mijarên herî zêde berbelav e, di edebiyata kurdî de jî cihekî mezin girtiye. Loma jî edebiyata kurdî di vê mijarê de gihîştîye standarda edebiyata klasîk a rojhilatê.

3. Li gorî agahiyên li ber destan heta niha di edebiyata kurdî ya klasîk de di mijara *Leyla û Mecnûnê* de 13 heb berhemên edebî hatine nivîsîn.

4. Di tarîxa edebiyata kurdî de *Leyla û Mecnûn* cara pêşî di sedsala XVIIIem de hatine nivîsandin. Di vê sedsalê de sê kesan (Mela Mihemedê Qulî Kendûleyî, Xanay Qubadî û Harisê Bedlîsî) *Leyla û Mecnûn* nivîsandine. Ji her deh hebên di çar heb di sedsala XIXem de (Mîrza Şefî'ê Kulyayî, Mela Mehmûdê Bazîdî, Mela Weledxan û Şêx Mihemed Canê Aqtepî) û şeş heb jî di sedsala XXem de (Mela Fercî Salih Şekîb, Eli Kemal Bapîr, Hacî Ebdulfettahê Hezroyî, Ebdulqadir Debayan, Ebdulcebbar Axayî Kanî û Mela Mihemedê Hezanî) hatine nivîsîn.

5. Ji van *Leyla û Mecnûnan* pênc heb bi kurdiya kurmancî (Harisê Bedlîsî, Mela Mehmûdê Bazîdî, Şêx Mihemed Canê Aqtepî, Hacî Ebdulfettahê Hezroyî û Mela Mihemedê Hezanî); pênc heb bi kurdiya goranî (Mela Mihemedê Qulî Kendûleyî, Xanay Qubadî, Mîrza Şefî'ê Kulyayî, Mela Weledxan, Ebdulqadir Debaya); sê heb jî bi kurdiya soranî (Mela Fercî Salih Şekîb, Eli Kemal Bapîr, Ebdulcebbar Axayî Kanî) hatine nivîsandin.

6. Ji van *Leyla û Mecnûnan* yên Mela Fercî Salih Şekîb û Eli Kemal Bapîr (ji farisî) û Ebdulcebbar Axayî Kanî (ji tirkî) werger in. Her deh hebên di jî telîf in. Hersê *Leyla û Mecnûnên* werger bi kurdiya soranî ne û di nav ên telîf de yên bi kurdiya soranî nînin.

7. Di edebiyata klasîk de xwezaya *Leyla û Mecnûnan* ew e ku bi teşeya nezmê (bi awayekî menzûm) bên nivîsandin. Lê digel vê jî wekî îstîsnayekê *Leyla û Mecnûna* Mela Mehmûdê Bazîdî bi şêweya pexşanê hatiye nivîsandin.

8. Dikare bê gotin ku di nav hemû *Leyla û Mecnûnên* kurdî de yên herî girîng, di kurdiya hewramî de ya Xanay Qubadî û di kurdiya kurmançî de jî ya Sewadî ye.

REFERANS

Adak, Abdurrahman, “Liceli Şairlere Genel Bir Bakış”, *Dünden Bu Güne Lice Sempozyumu Bildirileri*, weş. Mardin Artuklu Üniv., Mardin 2012.

Ateş, Ahmed, “Leyla ile Mecnûn”, *İslam Ansiklopedisi*, weş. MEB, İstanbul 1993, c.VII.

Baban, Cemal, *E’lamu’l-Kurd*, Daru Aras, Erbîl 2012.

Doskî, Tehsîn Î., *Leyla û Mecnûn*, weş. Spîrêz, Hewlêr 2004.

Ergin, M. Cevat, “Hazrolu Seyda Hacı Abdulfettah Yazıcı”, *D.Ü. İlh. Fak. Dergisi*, c.VIII, j.1 (2006), r. 109-130.

Ferrac, Ebdusettar Ehmed, *Dîwanu Mecnûn Leyla*, Daru Misr, Kahire 1979.

Hezanî, Mela Mihemed, *Mecmû’ya Menzûmeyan*, berhevkar: Zeynelabidîn Amidî, Kopyaya li pirtûkxaneya Abdurrahman Adak.

Hilmî, Refîq, *Şîr û Edebiyatê Kurdî*, Metbe’et Te’lîmî’l-‘Alî, Hewlêr 1988.

Hezroyî, Hacı Abdulfettahê, “Dîwan”, *Selasû Mennzûmat*, amd. Zeynelabidîn Amidî Diyarbekir 2004.

Huşyar, Cevdet, “Zexairu’t-Turasi’l-Kurdî fî Xezaini Petersburg”, <http://www.fnrtop.com/vb/showthread.php?t=712891>. (15.08.2014)

Îbrahîmî, Xeffar, *Xanay Qubadî Leyla û Mecnûn*, Binkey Jîn, Silêmanî 2011.

Kurdo, Qanatê, *Tarîxa Edebyeta Kurdî*, weş. Öz-ge Ankara 1992.

Mizuri, Abdulrehman, “Leyla û Mecnûna Harisê Bitlîsî”, wer. Alîxan Aras, <http://aso-zagrosi.over-blog.com/article-30477610.html>. (15.08.2014)

Pala, İskender, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, weş. L&M, İstanbul 2003.

Pîrbal, Ferhad, *Mela Mehmûdê Bayezîdî (1799-1867) Yekemîn Çiroknûs û Pexşannûsî Kurd*, weş. Aras, Hewlêr 2000.

Rudenko, M. B., *Opisanie Kurdish Rukopisy Leningradskii Sobranie*, Izdatelbstvo Vdstdçndy Literaturi, Moskova 1961.

Sağnıç, Feqî Huseyn, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2002.

Siwadî, *Leyla û Mecnûn*, amd. M. Reşit Irgat, Selman Dilovan, Nûbihar 1999.

Şêx Mihemed Can, *Leyl û Mecnûn* amd. Zeynelabidîn Zinar, weş. Pencînar, Stockholm 1992.

Temo, Selim, *Kürt Şiiri Antolojisi*, 2 c., weş. Agora, İstanbul 2007.

Timurtaş, Abdulhadi, “Haris el-Bitlisî ve *Leyla û Mecnûn* Adlı Manzûmesi” *I. Uluslar arası Dünden Bugüne Tatvan ve Çevresi Sempozyumu Bildirileri*, weş. Beyan, İstanbul 2008.

Xeznedar, Marûf, *Mêjuwî Edebî Kurdî*, 8 c., weş. Aras, Hewlêr 2010.

Yalar, Mehmet, “Hazrolu Abdulfettah Yazıcı ve Şairliği”, *Uluslararası Silvan Sempozyumu*, weş. Mardin Artuklu Üniv., Mardin 2012.

Zinar, Zeynelabidîn, *Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî*, Yekîtiya Nivîs-karên Kurd, Stockholm 1991.○